# Demên libendêmayinê bo zarokên di bin 18 saliyê de yên daxwaza parastinê (penaberiyê) kirine û dê û bavên wan li Norwêcê tune ne

## UDI niha hevpeyvînê bi kê re dike û bersiva daxwaznameyên wan dide?

UDI dê bi domdarî bi zarokên qasir re ên ku daxwaza parastinê dikin hevpeyvînê bike.

Eger doza te ya AMMR be, dibe ku çend meh derbas bibin heta were diyarkirin ka daxwaza te dê li Norwêcê an jî li welatekî din ku te tiliyên xwe lê dane were nirxandin.

Eger piştî hevpeyvînê hewcedariya UDI nebe lêkolînên din bike, em ê biryarê di zûtirîn demê de bidin.

## Çima hin kes berî min bersivê werdigirin?

Em pêşîniyê didin wan kesan ku demeke herî dirêj li benda bersivê ne. Lê hin doz ji yên din demeke dirêjtir dixwazin ji bo kirina hevpeyvînê û nirxandinê. Tevî ku divê tu ji yên din zêdetir li bendê bimînî jî, ev nayê vê wateyê ku me doza te jibîr kiriye. Ev hin sedem in ku dihêle ku dem dirêj bibe:

- Eger em piştî hevpeyvînê em di doza te de hewceyê lêkolînên zêdetir bin, ev dikare bibe sedem ku wergirtina bersivê demeke dirêj bixwaze.
- Eger UDI bibîne ku doza te divê li welatekî din ê AMMR were nirxandin, ev jî dikarebihêle ku dema li bendêmayinê dirêj bibe. Hingî dibe ku tu ji bo hevpeyvînê ji yên din zêdetir li bendê bimînî.
- Eger sedemên din hebin ku ji ber wan hîn hevpeyvîn bi te re nehatiye kirin an te hîn bersiv wernegirtiye, em ê parêzerê te agahdar bikin li ser sedema derengiyê.

Em dizanin ku libendemayîn giran e, û em bê hedan dixebitin da ku hemû daxwazên penaberiyê di zutiriîn wext de werin nirxandin.

Pêwîst nake ku tu bi UDI re têkiliyê daynî ji bo bipirsî ka kengî dê lênêrîna doza te xelas dibe. Em ê bersivê ji te re an jî ji kesê ku te temsîl dike re bişînin.

## Gelo tiştek heye ez dikarim bikim ku bihêle ku dema libendêmayinê kurtir bibe?

Tu dikarî hay jê hebî ku belgeyên te yên nasnameyî di zûtirîn demê de bighin me.

- Eger belgeyên te yên nasnameyî yên orîjînal hebin, divê tu wan radestî navenda polîsê herêmî bikî. Tu dikarî ji nûnerê xwe alîkariyê bixwazî ji bo radestkirina belgeyan.
- Eger li cem te kopî û wêneyên belgeyan hebin, tu dikarî wan bi xwe re bînî hevpeyvînê an jî bi postê bişînî vê navnîşanê:

Utlendingsdirektoratet (UDI)

Postboks 2098 Vika

0125 Oslo

Li ser belgeyan hejmara DUF-a xwe binivîse. Nûnerê te dê di vê yekê de alîkariya te bike.

## Nûkirina agahdariyê

Agahdarî li ser demên libendêmayinê ji Hezîrana 2026 ve derbasdar e.

Agahdarî dê nîvê Kanûna yekem 2026 an jî zûtir werin nûkirin eger guhertinên mezin çêbibin.